

**HIŞYARIYA VEKIŞÎNÊ
DADGEHA FEDERAL YA AUSTRALYA**

BINÇAVKIRINA NEQANÛNÛ YA KESÊN DAXAZA PENAXWAZIYÊ DIKIN DBE17

(bi daxwaza doza Mary Theresa Arthur) li dijî Hukumeta Australya

(VID1392 ya 2019)

BALDARÎ:

DIVÊ HÛN VÊ AGAHDARIYÊ BI BALDARÎ BIXWÎNIN.

GER HÛN LI AUSTRALYA DU YAN ZÊDETIR ROJÊN KAR DI NAVBERA **27ê TEBAXA 2011** Û **25ê SIBATA 2020** DE HATIBÛN GIRTIN JI BO WE Û KESÊN DIN DOZA DADGEHÊ HATIYE VEKIRIN.

DADGEHÊ BERYAR DA KU VÊ AGAHİYÊ JI WE RE BIŞÎNÊ JI BER KU HÛN HEWCEYE KU HÛN BERYARÊ BIDIN KA HÛN DIXWAZIN DI DOZÊ DE BIMÎNIN YA NA.

GER PIRSEKE WE DERBARÊ VÊ RAGIHANDINÊ DE HEBE, DIVÊ HÛN ŞÎRETA DADRÊSÎ WERBIGIRIN. HÛN **NIKARIN** BI DADGEHÊ RE PÊWINDIYÊ GIRÊBIDIN.

Heke hûn Îngilîzî nexwînin, ev agahdarî dê bi zimanên din li ser malpera jêrîn di bin sernavê "Binçavkirina neqanûnî ya kesên penaxwaziyê dixwaz dikin":

<https://www.mauriceblackburn.com.au/class-actions/current-class-actions/unlawful-detention-of-people-seeking-asylum-class-action/>. Her weha hûn dikarin kopîyekê bi zimanê xwe bi rêya parêzerê xwe bi zimanê xwe ji Maurice Blackburn Lawyers li ser 1800 930 956 yan îmeyle asylumseekerclassaction@mauriceblackburn.com.au bike.

1. Çima min ev danezane vergirtiye?

Ev danezane derbarê dosiyeyek dozgeriye ku ji aliyê kesekî bi navê “**DBE17**” ve hatiye destnîşan kirin. Ji ber sedemên qanûnî em nikarin navê wî yê rastîn bikar bînin. Ew di bin 18 salan de ye, ji ber vê yekê ev dosiya dozgeriye ji aliyê sergêrê doza wî Marie Theresa Arthur, ve hatiye destnîşan kirin.

Doz li Dadgeha Federal a Awusturalya hatiye destnîşan kirin. Ev dozek li dijî Dewleta Hevberjevendiya Awusturalya (“**Dewleta Awusturalya**”).

DBE17 dibêje ku ew û kesên din (“**endamên komê**”) ku ji 27-ê Augusta 2011-an heta 25-ê Februarya 2020-an li Awusturalya di bin binçav kirina koçberiyê da bûn, û bi *neqanûnî* ji aliyê Dewleta Awusturalya ve hatine binçav kirin. Hûn ji ber vê sedemê ev danezanê verdigirin ku gengaze hûn ji 27-ê Augusta 2011-an heta 25-ê Februarya 2020-an li Awusturalya di bin binçav kirina koçberiyê da bibin. Ji ber vê gengaze hûn yekê ji endamê komê bin.

2. Sîstema Qanûnî ya Awusturalya

Sîstema Qanûnî ya Awusturalya dihêle ku kesek (wekî “**daxwaker**” tê binavkirin) li hember kesek an şirketek an dewletkî din (ku wekî “**bersûc**” tê binavkirin) daxwaza qerebûya darayî bike, eger daxwaker bibawer be ku ew ji ber tiştê ku bersûc kiriye zirarê an jî ziyan dîtiye, bi şertê ku bingehek kêrhatî ji bo îdîa(yên) an gilî(yên) dijî bersûcî hebe.

Hemû dadgehên Awusturalya serbixwe ne ji Parlamento û endamên Parlamentoyê. Dadgehê ji bo rêgezên ku dişopînin rêzikên zelal hene. Ev babete pêk tê ji qanûnên têkildarî amadekirina şahidiyan û sepandina prensîbên hiqûqî li ser wan şahidiyan hene da ku li gorî qanûna dozê biryarê bide.

3. Çalakiya komî çî ye?

Ev dosiya dozgeriyê “**çalakiyek komî** ye. Çalakiya komî dosiyeyek dozgeriyê ye ku ji aliyê kesek ve (anko daxwaker) ji bo komek kesan (anko endamên komê) li dijî kes an saziyek din (anko bersûc) tê destpê kirin.

Di çalakiya komî de, daxwaker û endamên komê li hember bersûcî îdîa yan giliyên wekhev hene.

4. Ev çalakiya komî li ser çî ye?

Di ev çalakiya komî de, DBE17 diyar dike ku binçavkirina kesên ne-welatiyên bi neqanûnî ji aliyê Dewleta Awusturalya ve tenê di rewşekê de *qanûniye* ku:

1) Binçavkirin her dem ji bo armancên jêrîn be:

- a) Dersînorkirina ji Awusturalya, di nav de veguheztin bo welatek lêkolînerê herêmî (di vê rewşê de, Nauru an Papua Guinea Nû);
- b) Bidestandin, venêrîn û biryara li ser daxwaza vîzeyê ku dihêle kesên ne-welatiyê neqanûnî bikevine nava Awusturalya û nav de bimînin; an
- c) Biryardana li ser qabûl kirina daxwazek nirxdar ji bo vîzeyê.

2) Armanca têkildarî binçavkirinê pêkan e.

3) Armanca binçavkirinê her dem pêk were û bilez ku pêkan be, pêk were.

DBE17 îdîa dike ku ew û endamên komê ji ber yek ji dû sedemên jêrîn ve ji aliyê Dewleta Awusturalya ve bi neqanûnî hatine binçav kirin:

- a) DBE17 û endamên koma ku piştî 12-ê Augusta 2012-an gihîştin Awusturalya û ew mecbûr bûn ji Nauru an Papua Guinea Nû re bêne veguhestin, lê bi neqanûnî hatin binçav kirin ji ber ku ji ber ku yan:
 - i. Veguhestina ev mirov ji wan deran re li gorî mantiqê nepiraktî û nepêkan bû; an
 - ii. Mirov ji wan deran re hatin veguhestina, lê ev di zûtîrîn dema ku pratîk bibe, pêk nehat.
- b) Dayîna biryarê liser vîzayê ji bo DBE17 û endamên komê ji bo mayîna li Awusturalya zêdetir dirêj bû.

Dewleta Awusturalya qebûl nake ku DBE17 û endamên komê bi neqanûnî hatine binçav kirin û xwe li hember vê çalakiya komî diparêze.

5. Gelo hûn endamê vê komê ne?

Eger hûn endamê vê komê ne ku:

- a) Di navbera 27-ê Augusta 2011-an heta 25-ê Februarya 2020-an zêdeyî du rojên karî di her beşek ji Awusturalyê di bin binçavkirina koçberiyê da bûne.
- b) Hûn ji ber betalkirina vîzaya xwe ya Awusturalya yê nehatin binçav kirin.
- c) Li her demê piştî hatina Awusturalya, bi dilxwazî venegeriyên welatê xwe an welatekî din ê ku hûn berî ku werin Awusturalya lê rûniştibûn.
- d) Ji 27-ê Augusta 2011-an ve tu carî ji Awusturalya an ji welatek din ku hûn lê rûniştibûn vegeyane û ji Awusturalya re venegeriyên;
- e) Ji ber ku vîzaya we xilas bûbû hûn nehatin binçav kirin û hûn bêyî vîzayek derbasdar li Awusturalya diman, xênjî ku paşê vîzaya parastinê radestî we bû;
- f) Qet, we nirxandina ewlehiya nerênî li gorî *Zagona Rêxistina Ewlekariya Dewleta Awusturalya ya 1979* (Cth), vernegirt.

Eger hûn piştrast nînin ku hûn endamê vê komê ne an na, divê hûn li hejmara 1800 930 956 li Kompaniya Parêzerên Maurice Blackburn bigerin an jî bi emaila jêr re peyamek bişînin: asylumseekerclassaction@mauriceblackburn.com.au yan bêyî derengî bixwe rabêja hiqûqî bistînin.

6. Ez endamê komekê me û ez dixwazim beşdarî çalakiyê bikim - divê ez çi bikim?

Eger hûn dixwazin beşdarî vê çalakiya komî bibin, niha **ne** pêwîst ye ku hûn tiştek bikin.

Helbet, hûn dikarin agahdariyên têkiliya xwe li ser malpera Kompaniya Parêzerên Maurice Blackburn ku parêzerên DBE17 ne, bişînin: <https://www.mauriceblackburn.com.au/class-actions/current-class-actions/unlawful-detention-of-people-seeking-asylum-class-action/>. Bi vî rengî, di pêşerojê de, her agahdarî di derbarê çalakiya komî de dê ji navnîşana, emaila we an jimareya telefona we ya ku wê şandiye, were şandin.

Ji bo mayina li vê çalakiya komî, hûn niha nemecebûrin ku diravî bidin: ji bo heqê ti pere ne: Agahiyên bêtir li beşa jêrîn de hene: “8. *Eger ez di çalakiya komî de bimînim ez mecbûrim ku diravî bidim?*”

Mayîna di vê çalakiya komî de qet bandorê li vîzeyê we ya gengazî neke. Eger di derbarê vîzeyê xwe de pirsên we hene, divê hûn bi nûnerê koçberiyê re têkilî daynin.

Eger hûn di vê çalakiya komî de bimînin, hûn ê "neçar" bin encama çalakiya komî bişopînin. Ev tê vê wateyê ku hûn neçar in ku encamê bipejirînin, û ev encam, çî serketî be, çî serneketî û çî jî çareserî be, ji we re neçarî ye ku qebûl bikin.

- a) Eger çalakiya komî serketî be, gegaze mafê we hebe ku hûn ji beşek ki biryara derçûyî yan rêjeya çareseriyê bi dest bînin. Anku gegaze diravek ji we re were dayîn.
- b) Eger çalakiya komî neserneketî be an jî kêmtir ji tiştê ku dihate hêvî kirin serketî be, gegaze dravek kêmtir ji we re were dayîn yan qet dirav ji we re neyê dayîn. Lêbelê, ne pêwîst ye ku hûn qet diravî bidin.

Çî ev çalakiya komî serketî e an na, çî hûn di nav de bimînin an ne, paşê hûn nekarin dosiya dozgeriya xwe li dijî Dewleta Awusturalya yê ji ber heman giliya binçavkirina neqanûnî ya di Beşa “3. *Ev çalakiya komî çî ye?*” hate şirove kirin, destnîşan bikin.

7. Ez endamê komekê me lê ez naxwazim beşdarî çalakiyê bikim – divê ez çî bikim?

Eger hûn nexwazin di vê çalakiya komî de bimînin, divê hûn Dadgeha Federala Awusturalya agahdar bikin. Ji vê babetê re "betalkirin" tê gotin.

Di rewşa betalkirinê de:

- a) Çî encama ev çalakiya komî hebe jî, hûn ji vê yekê qet dravî nastînin;
- b) Hûn ne neçar in ku encama çalakiya komî bicîh bînin, û eger hûn bixwazin dosiya dozgeriya xwe li ser heman giliya binçavkirina neqanûnî li dijî Dewleta Awusturalyan re bêxine rê, hûn dikarin wiya bikin, bi vê şertê ku hûn dosiya dozgeriya xwe di nav sînorê demkiyê qanûnî de destnîşan bikin.

Eger hûn dixwazin dosiya dozgeriya xwe li dijî Dewleta Awusturalya bibin dadgehê, divê hûn **berî** ku biryara betalkirinê, bi parêzerekî re liser doza xwe û sînorê demkiyê têkildar, bişewirin.

Eger hûn dixwazin betal bikin, divê hûn forma heyî li dawiya vê danezanê de tekmîl bikin û ji navnîşana jêrîn re bi email ê bişînin an post bikin:

The Registrar
Federal Court of Awusturalya
Victorian District Registry
305 William Street
Melbourne VIC 3000
an
vicreg@fedcourt.gov.au

XALÊN GİRİNG:

Pêdiviyê ku forma betalkirinê herî dereng heTa 4-ê Decembara 2020-an ji Nivîngê re were şandin.

Wekî din, betalkirina we nayê berçav girtin û hûn ê di vê çalakiya komî de wek endamê komê bimînin.

Her yek ji endamê koma ku dixwazin betal bikin divê forma betalkirinê bi cuda dagire.

8. Eger ez di çalakiya komî de bimînim divê ez dravekî bidim?

Niha ji bo mayîna di çalakiya komî de ne pêdivî ye ku hûn drav bidin.

Kompaniya Parêzerên Maurice Blackburn vê çalakiya komî li ser bingeha "serketina bi şert" dişopîne. Ev tê vê wateyê ku tenê eger çalakiya komî bi ser bikeve, dê dirav ji kompaniyê re were dayîn.

çalakiya komî bi ser bikeve, dravê ku Kompaniya Parêzerên Maurice Blackburn dê ji bo karûbarên xwe yê dozgeriyê bistînin dê bi ev qasê be ku ew bikarin ji Dewleta Awusturalya yan her aliyek din bistînin.

Tenê ger pêwîst be ji bo vergirtina şîreta hiqûqî ya kesane ji bo qedandina îdîaya xwe, pêwîste ku di dawîya dozê de diravekî bidin. Hûn dikarin ji Kompaniya Parêzerên Maurice Blackburn an parêzerên din bixwazin ku vê yekê ji bo we bikin. Hûn dikarin bi Kompaniya Parêzerên Maurice Blackburn re têkiliyê daynin ji bo ku kopiyek ji şert û mercên ku ew bikar dînin, bistînin.

9. Hûn li kû dikarin kopiyek ji belgeyên têkildar bistînin?

Kopiyên belgeyên têkildar, di nav de daxuyaniya îdîayê, û parastin an parastinan bi awayên jêrîn dikarin peyda bikin:

- (a) Daxînkirina wan ji navnîşana <https://www.mauriceblackburn.com.au/class-actions/current-class-actions/unlawful-detention-of-people-seeking-asylum-class-action/>;
- (b) Lêkolîna di navbera saetên 9-ê sibê heya 5-ê êvarî li yek ji nivîsgehên Kompaniya Parêzerên Maurice Blackburn, agahdariyên têkiliya bi wan li ser www.mauriceblackburn.com.au hene yan bi rêya têkiliya bi telefona 1800 930 956 berdestin;
- (c) Bi rêya têkiliya bi Herêma Qeyda Dadgeha Federal re (agahdariya têkiliyê qeydkirî li ser www.fedcourt.gov.au) û dayîna xercê lêkolînê yê têkildar; an
- (d) Lêkolîna wan li ser malpera Dadgeha Federal li navnîşana: <https://www.fedcourt.gov.au/law-and-practice/class-actions/class-actions>.

Ji kerema xwe babetên li jor bi baldarî berçav bigirin. Eger li ser babetekê pirsên we hene, divê hûn bi Kompaniya Parêzerên Maurice Blackburn re li ser 1800 930 956 re têkilî daynin an jî bi navnîşana jêr re emailê bişînin: asylumseekerclassaction@mauriceblackburn.com.au an jî bi xwe ji şîreta hiqûqî bigerên. Nabe hûn di biryardayian xwe de dereng bimînin.

Form 21
Rule 9.34

OPT OUT NOTICE

No. VID1392 of 2019

PÊVEK B

Vê formê tenê eger ku hûn nexwazin beşdarî vê çalakiya komî bibin, bikar bînin.

Forma 21
Qanûn 9.34

DANEZANA BETALKÎRÎNÊ

Jimare VID1392 ji 2019

Federal Court of Awusturalya
Qada Qeydbûnê: Vîktoriya
Beşa: Giştî

DBE17 (ji aliyê sergêrê doza wî Marie Theresa Arthur)

Daxwazker

Dewleta Hevberjevendiya Awusturalya

Bersuç

Bo: The Registrar
Federal Court of Awusturalya
Qada Qeydbûnê Vîktoriya
Owen Dixon Commonwealth Law Courts Building
305 William Street
Melbourne VIC 3000

[Nav û paşnavê we], Endamek ji komê, di vê çalakiya komî de, li gorî Benda 33J ji *Zagona Dadgeha Federal a Awusturalya 1976*, diyar dike ku *[Nav û paşnavê we]* tê çalakiya komî betal bike.

Roj: [Ji bo nimûne, 19 June 20.]

Îmzeya we:

Nav û paşnavê we:

Rojbûna we:

Navnîşana Emailê:

Jimare telefon:

Li dora tiştê xirxalek bikişînin: Endamê Komê AN sergêrê qanûnî yê endamê komê AN NE Endamek Komê